



BANDORA FARISÎ DÎ EDEBÎYATA KURDÎ YA TESEVVÎFÎ DE

(PP 76 - 90)

Profesorê alikar. Abdulcebbar KAVAK

Zaningeza Agri İbrahim Çeçen, Fakulteya Zanistên İslamî, Beşa Tesevvifê

akavak@agri.edu.tr

Agri/Turkiye

Published: 29/10/2020

DOI: <https://doi.org/10.31972/jickpll19.06>

Kurte

Terîqetên ku bi destpêkirina sazkirina tesevvufê di cihana İslamê de derketin, di nav Kurdan de jî belav bûn. Tekkeyan ku cihê perwerdehiya tesevvufê bûn, di heman demêde bûne navendên sereke yê çalakiyên zanistî û wêjeyî yê girêdayê tesevvufê. Van çalakiyên edebî hêdî hêdî vedigerin nav tevgerê bi navê “Edebiyata Tesevvifê yan Edebiyata Tekyeyê”. Zimanê bingehîn ê vê tevgerê Farisî bû. Civakên cûda ên misilman ku zimanê dayikê wan ne Farisî bû, van jî bi karanîna Farisî re demê dirêj berdewam bûn.

Kurd, ji hela erdnigariya xwe ve di nav çandên Erebi, Farisî û Tirkî de cih digirin. Ji ber vê yekê, Kurd bi çandên van civakên misilman ên kul i dora wan re têkilî danîn. Piştî ku bûne misilman, Kurd di mizgeftan û medreseyan de ji bo fêrbûna Quranê û ehkama olî bi Erebi li hev ketin. Ji hela Farisî ve mîna civakên din di edebiyatê de di bin bandora Farisî de man.

Ji sedsala şazdehan dema ku Edebiyata Kurdî ya Tesevvifî pêşkeftinek mezin nişan da, bandora zimanê Farisî kê mî bû lê bi tevahî wînda nebû. Bandora Farisî di nav Divan û helbestên gelek helbestvanan wekî Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Ehmedê Xanî, Mewlana Xalid Şehrezorî, Mewlewî, Mehîwî, Şêx Reza Talabanî, Xelîfê Yusuf, Evdîrehman Extepe de tê hest pê kirin.

Di vê xebatê de, dê helbestên Farisî yê ku ji aliye helbestvanên naskirî ve di varê Edebiyata Kurdî ya Tesevvifî de hatiye nivisandin û bandora Farisî li ser van helbestan, werin gotûbêj kirin.

Peyvên Sereke: Edebiyata Kurdî Ya Tesewifî, Farisî, Sûfiyên Kurd, Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî, Mewlana Xalid Şehrezorî

THE INFLUENCE OF PERSIAN IN SUFI KURDISH LITERATURE

Assoc. Prof. Dr. Abdulcebbar KAVAK

Agri İbrahim Çeçen University Faculty of Islamic Sciences, Departement of Sufism



qewimîn de rolekê çalak listin. Guhertinên ku di qada siyasî û civakî de çêbûn bil ez û bez van ra adabte bûn. Piştî mizgeft û medreseyan, yek ji van deveran ku tekye herî zede belav bûn erdnigariya Kurdî ye.

Kurdan, bi Îslamê re, girîngiyê didine Erebi û zanistên Îslamî da ku Quran'a pîroz fêr bibin. Di nav medreyên ku damezrandin, digel zanistên Îslamî giringî dane ziman û edebiyata Erebi jî. Li aliyê din Farisî ku zimanê sereke yê edebiyata tesevvîfî ye ihmal nekirin. Hejmara sufîyên Kurd ên ku bi helbestên xwe yê bi Farisî hatine nivîsin gihiştine cihekî rêzdar di cihana Îslamî de ne kê m in.

1. Kurd û Tesevvîf

Seranserê dîroka Îslamê de, Kurd li her varê de wek endamekî çalak ê cihana Îslamê hebûna xwe domandîye. Kurdan giringî dane avakirina mizgeftan ji bo belavkirina vê olê di qada civakî de û hewildanek dilpak ji bo fêkirin û fêrbûna Quranê pêk anîn. Ev medreyên ku di serdema Emevîyan, Ebbasîyan, Selçûqîyan û Osmanîyan de hate avakirin, Kurd di van medreseyan de wek xwendekar û mûderris rola erînî listin.

Yek ji warên ku Kurd lê aktif in, tesevvîf e. Zahid û abiden ku ji sedsala sêyemîn a Hicrî ve di civaka Îslamê de xwedî cihekî rêzdar bûn, di wextê de wek sufîyan hatin bi nav kirin. Vê rewşê rê li ber koma olî ya nû vekir ku piştî koma aliman jê re dibêjin koma sufîyan. Berhemên sufîyan ên ku bi piranî li ser exlaq û menewiyatê hatine nivîsin, bûn binesaziya tesevvîfê ku di sedsala pênc û şeşê ya Hicrî de dest bi sazibûnê kir.

Kurdên ku li Iraq, Îran û rojhilat û başûrê Anatolyayê xwedî jiyaneke çalak bûn, piştî ku tesevvîf li her derê cihana Îslamê de belav bû, li heman demê de ev jî tewgera exlaq û meneviyetê re xwedî derketin. Bi demê re, ew bûne yek ji wan civakan ku çalakiyên tesevvîfê herî pir in. Di pêvajoyên pişkeftina tesevvîfê de em dikarin behsa gelek zahid û sufîyên Kurd bikin. Hin ji wan di damezrandina terîqetan de bi bandor bûn, hinên din di warê edebiyata tesevvîfî de xwedî gotinekê bihêz bûn.

1.1. Di Nav Kurdan de Belavbûna Fikra Tesevvîfê û Terîqetan

Kurd di navbera du navendan wekî Xorasan û Bexdayê ku li aliye tesevvîfê de herî tund in, mane. Ji ber vê yekê, çalakiyên tesevvîfî ku di Îran û Iraqê de destpê kiriye, zûtir bandora vê li ser civaka Kurdan çêbûye. Wekî din, tete zanîn ku Kurdên ku li cihana Îslamê serdana navendên cihêreng ên zanistî û çandî kiriye wan ji berhevdana zanistî û tesevvîfî a wê serdemê sûd wergirtin. Ji bilî Mekkeh û Medine, hin âlim û mutesevvîfên Kurd ku li medrese û tekyeyên Bexda, Şam, Qahire û Stenbolê de perwerde bûn, mane li wan



Rifâî pesna wî dikirin û li Iraqê di navbera Ereba û Kurdan de cihekî rêzdar girtiye. Dede Garkın ku yek ji murîdên wî ye, terîqeta Vefaiyye di navbera eşîretên Turkmen ên Anatolyayê daye naskirin.

Terîqeta Edewiyye ku damezrênerê vê Şêx Edîyê kurê Musafir e, bi piranî di nav Kurdan de li bakûrê Mûsilê belav bûye. Terîqeta Edewiyyeyê de taybetmendiya terîqetên Kurdî heye. Şêx Edîyê kurê Musafir di Lubnanê de hatiye dinyayê û mezin bûye. Birastî der heqê tşkiliya Şêx Edî bi Kurdan re çend nerînen cuda hene. Di gel vê ev çalakîyên xwe yên tesevvîfî di nihala Laleşê de li Tekyeya Laleşê de kir û bû mezhera eleqe û rêzdarîya Kurdan.¹⁰

Terîqeta Şaziliyye ku li aliya Ebu'l-Hesenê Şazilî (w. 656/1258) hatiye damezrandin, bi piranî bakûrê Afriqayê belav bûye. Li rojavayê Asyayê piştî Suriyê herêma ku herî zêde belav bûye bajarê Merîwanê Îranê ye. Merîwan ku Kurd li wir nîştenci ne, ji dawîya sedsala sêzdemîn heta sedsala hejdemînê terîqeta Şaziliyye re xwedî derketi ye. Tekya ku li gundê Kakû Zekeriyya hatiye avakirin, wekî fer'ekî terîqeta Şaziliyye li Îranê kar kiriye. Hin şêxên ku di vê tekyeyê de postnişînî kirine ev kesin: Şêx Xalid kurê Hesenê Şazilî, Şêx Silêman kurê Xalidê Şazilî, Şêx Evdîrehman Ehdelê Şazilî, Şêx Zekeriyyayê Şazilî (w. 810/1407), Muhammed Sâdikê Şazilî, Şêx Ehmedê Şazilî, Şêx Evdîrehmanê Şazilî (w. 897/1491), Şêx Şehabeddîne Şazilî (w. 1072/1661).¹¹

Her çend terîqeta Qadiriyye li Bexdayê hate damezrandin, ew hema hema di hemî navendên girîng ên zanistî û çandî yên cihana Îslamê de cihek rêzdar bidest xist. Ew hîn jî wekî yek ji dû terîqetên mezin di nav Kurdan de hebûna xwe didomîne. Deverên Kurd ên sereke ku terîqeta Qadiriyye lê belav bûye her dû herêmên Musil û Şehrezor in. Ev terîqet bi demê kurt de di navbera Kurdên Anatolya, Suriye û Îranê jî belav bû.

Yek ji terîqetên herî bi bandor a ku bandora wan heta îro berdewam e di nav Kurdan de Neqşibendiyye ye. Ev terîqete serî de bi piranî li Asya Navîn û Îranê belav bû ku navenda çalakîyên terîqetê Buxara bû. Lê serdema Ubeydullahê Ehrar (w. 895/1490) û Ehmed Sirhindî (w. 1034/1624) ku wek Îmamê Rebbanî di hate binavkirin de di navbera Kurdên Efqanistan û Îranê de pêşkevtinek berbiçav dest êxist.¹² Serdema ku terîqeta Neqşibendiyye bi giştî bandora vê li ser Kurda bi hêz bûye, serdema Mewlana Xalid e. Mewlana Xalid mutesevvîfekê Kurd li Şehrezorê bû. Bi deste wî terîqeta Neqşibendiyye li Rojhilata Navîn de gellek

¹⁰ Selefi-Duskî, *Mu'cemu 'ş-şu'arâi'l-Kurd*, r. 47-48.

¹¹ Abdulcebbâr Kavak, "Abdüssamed Tûdar'ın Nûru'l-Envâr'ına Göre İnan'da Şaziliyenin İzleri", *Tasavvuf İlmî ve Akademik Araştırma Dergisi*, 34(2014/2), r. 58-67.

¹² Hamit Algar, *Nakşibendilik, Weşanên İnsan*, Stenbol 2013, r. 69-81.



Gava ku berhem û helbestên Melayê Cizîrî û Ehmedê Xanî di derdorên medrese û tekyeyan de dihate xwendin, çarînen Feqîyê Teyran jî destpê kir di navbera gel de belav bû. Li alîyê din Mewlida Nebî ya Mele Hüseyne Bateyî di warê edebiyata Kurdî ya tesevvîfî de cîhek giring girt.¹⁵ Rêz û hurmeta ku Mewlîdê Silêman Çelebî di nav Tirkan de li Anatolyayê bidestxistibû, Mewlida Bateyî jî heman rêz di nav Kurdan de bi destxist. Bi rastî, eger em bibêjin ku heta niha Mewlidek ji Mewlida Bateyî pirtir nehatiye nivîsandin ev gotinê me nabe mubalaxa.

2. Bandora Farisî Li Ser Edebiyata Kurdî Ya Tesevvîfî

Em dikarin bibêjin ku gotin û sembolen tesevvîfî yê Farisî bi gelemperî di edebiyata Kurdî ya tesevvîfî de hatiye bikaranîn. Em vê yekê di helbestên ku bi Kurdî û bi Farisî hatine nivîsandin de dibînin. Ji xeynê vê, Kurdên ku li Îranê dijîn bi bitebîetê hal zêdetir di bin bandora Farisî de mane. Ên ku li Iraq, Suriye û Herîma Qefqasê dijîn li gor Îranê bi Kurdîyekî zelal axaftine. Lêbelê disa jî kê m jî be ev herêmên digel Tirk û Ereban dijiyan de bandora zimanên Tirkî û Erebi li ser helbestên Kurdî de çêbûye.

Ne raste ku meriv bifikire ku Farisî tenê bandora vê li ser helbestvanên edebiyata Kurdî ya tesevvîfî de çêbûye. Bandora Farisî di warê edebiyatê de li ser hemî civakên Misilman çêbûye û ji bo demek dirêj devam kiriye.

Emê hewl bidin Bandora Farisî li ser edebiyata Kurdî ya tesevvîfî di bin dû sernava vekolin.

1. Nivîsandina suffiyên Kurd helbestên Farisî
2. Nîşanên Farisî di helbestên Kurdî ên tesevvîfî de.

2.1. Nivîsandina Suffiyên Kurd Helbestên Farisî

Bendek ji Dîwana Mawlana Xalid Şehrezorî:

من که سرگردان جانانم چه باک از خانمان
یا مرا کی در دل آید فکرت سود و زیان

Ez ku heyrana canan im. Ma ez dikarim ji xan û mana bifikirim?

An fikra berjewendiyê û zîrarê tê bîra min?

¹⁵ Xeznedar, *Mêjûyê Edebê Kurdî*, II/289-482.



در دل تتکم چنان سودای یثرب زد علم

جای کنجایش کجا دارد درو یاد جنان

Evina Medinê di dile min ê teng da wisa bicih bû kul i wir behsa bihiştê jî nayê kirin.

یثرب آن خاکست تبعا دام آورد دل

ز آبدانی اندر و نه نام بود و نه نشان

Dema ku Medine wek bajêr hêj nehatibu navandin û îşaretkirin, ev cih dile Tubba'ê kire lepikê de.

یثرب آن خاکست جبرئیل امین با صد نیاز

آمدی بهر طوافش بر زمین از آسمان

Medine axek wusa ye ku Cibrîlê Emîn bi sed ricayan ji bo ziyareta wî ji ezmen hat xwar.

یثرب آن خاکست پیش از خلق آدم صبح و شام

بهری طوفش آمدندی زمره روحانیان

Medine axek wusa ye ku berî afirandina Adem, cıvata Ruhaniyan sibê û êvarê dihatin serdana wî.

از خیال اینکه خواهد کشت جای دوست بود

پیشتر از آبدانی قبله گاه انس و جان

Medine bi ramana ku ew ê bibe cîhê heval, hêj berî bibîte bajêr, qıbla gel ûcınan bû.

هست اکنون خواب گاه او خجالت بین که من

سالها بگذشت از عمر و نکردم طوف آن

Îro Medine cîhê razanê (mirina) wî ye. Lê tu mehcubiyeta min bibine ku min, tevî çend salan nekari biçim serdana wî.

خالدا تا کی نشینی در خجالت منفعل

خیزو کرد مرقدش بر کش فغان از سوز دل

Ey Xalid! Heta kengî dê rûnê wek mehcûb û munfeil? Rabe û li dora tirba wî bi dil bigrî.



Medhiya Şêx Rezayê Talabanî der Heqê Şahê Neqşibend:¹⁶

قبله حاجت بود روی بهاء الدین ما
Qibla haceta bu rûyê Bahaddinê me

طاق محرابست ابروی بهاء الدین ما
Kemera mihrabê ye brûyê Bahaddinê me

تکیه روحانیان است آستان حضرتش
Tekya rûhaniayan e cihê (hezreta) wî

منزل جانان بود کوی بهاء الدین ما
Xaniyê dilavanan bû gundê Bahaddinê me
بوی بوبکرست بویش در مشام سالکان
Bihna Ebûbekir e bihna wî li cem salikan

خوی پیغمبر بود خوی بهاء الدین ما
Exlaqa pêxember bû exlaqa Bahaddinê me

هر کسی آرام باید از پریشانی غم
Her kesek ji xem û perîşanê xılas dibe

در قرار تاب گیسوی بهاء الدین ما
Di qerara kezîyên Bahaddinê me

پنجه گستاخ دست منکران را بشکند
Pença kustaxê deste neyaran bişkin

¹⁶ Şêx Rezayê Talebanî, *Dîwanê Şêx Rezayê Talebanî*, Şerh: Şakûr Mistefa, Çapxaneyê Aras, Hevlêr 2010, r. 250.



قوهه اقرار بازوی بهاء الدین ما

Bi hêza bazûyê Bahaddinê me

جستجو کردم بحمد الله در بحر رضا

Min di behra Rîza(yê Xuda) da lêkolîn kir

یا فتم لؤلؤ ز نو بوی بهاء الدین ما

Min mirarî dit carek din di bihna Bahaddinê me

2.2. Nîşanên Farisî di Helbestên Kurdî Ên Tesevîfî de

Ji Dîwana Melayê Cizirî¹⁷

Sebahulxeyri xanê min şehê şîrînzabanê min

Tu wî rûh û rewanê min bibit qurban te canê min

Te'alallah çi zat î tu çi wê şîrînsifat î tu

Ne wek qend û nebat î tu yeqîn rûh û heyat î tu

Heyat û raheta canim sebahulxeyri ya xanim

Were bînahîya çehvan bibinim bejn û balayê

Sebahulxeyri mesta min letîfa **cam** bi desta min

Xumar û **meyperesta** min tu wî meqsûd û qesta min

Ji meqsûdan tu wî bes min bibin ber çerxê etles min

Ji xeyrê te nevêt kes min bi reştûzên muqewwes min

¹⁷ Mela Ehmedê Cizirî, *Dîwan*, Wergêr, Osman Tunç, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2008, r. 196.



Di benda **zulfê** çewkan im sebahulxwryi ya xanim

Were bînahîya çehvan bibinim bejn û balayê

Ji wê **zulfê** ji wê bendê reha bim lê ji peywendê

Sîyehçêşmê sipîzendê te sohtim şophetê findê

Şuphê şem' û şemal im ez ji ber hubba te lal im ez

Ze'îf im wek hilal im ez **sifetgoyîn** dikalim ez

Vi bulbul ra bi eyvan im sebahulxeyri ya xanim

Were bînahîya çehvan bibinim bejn û balayê

Qesîdeyek Mewlana Xalid bi zaravayê Goranî

هامسران ناسب

محبوبیم هن شای عالی ناسب

Hamserân neseb

Mahbûbîm hen şâyî âlî neseb

اسمش محمد قریشی و عرب

اداش آمنه کناچه وهب

İsmeş Muhammed Qureyşî ve Ereb

Edaş Âmine Kunâçeyê Vehb

تمامی عمرش شصت و سه سالن

بابو باپیرش بی طرزوحالن

Temamê umreş şist u se sal in

Bab u bâpîreş bi terzu hâl in



عبدالله عبد المطلب هاشم

عبد المنافن بزانش لازم

Abdullah bin Abdilmuttalib bin Haşim

Abdulmenaf bizâneş لازم

نه کوتا نه برز سپی کندم کون

نکوتن سایش نروی دنیای دون

Ne kûta ne berz sıpi kendum kûn

Ne kevten sâyeş nerûyê dÛnyâyê dÛn

بولد بین جه مکه انور

چل سال چاکه مند بی و پیغمبر

Be veledbîn cih Mekke-i Enver

Çil sal çakemend bî ve pêxember

وسیزده هنی او خور جمینه

راهی بی کوچ کرد شی مدینه

Ve sîzdeh henî ô hÛr cemîne

Râhî bî koç kerd şeyê Medine

چو که مقیم بی تا مدده ده سال

مرکش پی آماجلا بیزوال

Çu ki mukîm bî tâ müddeyê deh sal

Merkeş peyi âmâclâyê bî zevâl

برشی جی دنیای فانی بی بنیاد

ابله کسیون دل پیش کرو شاد

Bereşî cî dÛnyâyê fânî bî bünyâd

Ebleh kesiyûn dil pîş ker u şâd



صد و بیست و چوار هزار پیغمبر

سه صد و سیزده رسول رهبر

Sed u bist û çar hezar pêxember

Sê sed û sîzdeh resûl rehber

ابراهيم ونوح و موسى اولو العزم

عيسى محمد بزآنش و جزم

İbrahim û Nuh û Musa ulu'l-Azm

Îsa Muhammed (aleyhimusselam) bizaneş û cezmi

سيد كونين ختم المرسلين

چه ما سوای حق بهتر چه کردین

Seyyidê kevneyn xetmi'l-murselîn

Çi mâsivâyê Hak bihter çi kerdin

Encam

Kurd yek ji civakên çalak ên cihana Îslamê ne. Seranserê dirokê di erdnigariya ku Kurd niştecî bûne di bin serveriya gelek imparatoriyan cihêreng de mane. Di gel vê heta roja îro Kurd karin çand û kevneşopiyên xwe biparêzin.

Piştî ku Kurd bûn Misilman, ji bo çand û şaristanîya Îslamê hewlele ciddî dan. Wan ji bo mirata çanda Îslamê di warên zanist, tesevvîf, felsefe, edebiyat û hunerê de berhemên hêja nivîsandine. Kurd ji bo ku mirasa oli bigîje nîşa nû di warê zanistî de zimanê Erebi, di warê edebî de wek civakên Misilman ên din zimanê Farisî bikaranîne. Bihevreyîyana Kurdan digel Fars û Ereban û bûna zimanên Erebi û Farisî dû zimanên fermî ên deselatên serwer, bû sedema dûrketina Kurdan ji bikaranîna zimanê xwe yê zikmakî. Sedsala yazdehê ku di warê ziman û edebiyata Kurdî de berhem hatine nivîsandin serdemê giring e. Sedsala şanzdeh û hefdêhê dû serdemên giring in ku di warê ziman û edebiyata Kurdî de berhemên hêja hatin nivîsandin. Di vê serdemê pêkhatina piraniya helbestvanan ji sufîyan, di pêşkeftina edebiyata Kurdî ya tesevvîfî de rolek giring list. Helbestvan û nivîskarên mutesevvîfî ên mîna Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyrân, Ehmedê Xanî, Hüseyin Bateyî, kesayetiyên pêşeng ên van serdeman in. Berhemên Kurdî ku wana nivîsibûn, him di nav gel him jî di nav koma alim û sufîyan de belav bû û cihek rêzdar bidest xistin.

Di gel van pêşkeftinên erênî di warê edebiyata Kurdî ya tesevvîfî de, Kurdan Farisî re bi tevahî ji bir nekirin. Her çend helbestvanên Kurd wekî berî mijûl nebûn jî, lê kêma jî be nivîsandina helbestên Farisî û bikaranîna peyv û têgehên Farisî ên tesevvîfî devam kir.



Çavkanî

- Abdulvahid, Gulsume Cemîl, *Kurdistan fi ahdi 's-Sasaniyyîn*, Matbaatu Wizareti't-Terbiye, Hevlêr 2007.
- Adak, Abdurrahman, *Destpêka Edebiyata Kurdî*, Weşanên Nubihar, Stenbol 2013.
- Algar, Hamit, Nakşibendilik, Wergêr: Cüneyt Köksal vd., Weşanên İnsan, Stenbol 2013.
- el-Berzencî, Terîfe Ahmed Osman, *Îshâmâtu 'l-Ulemâi 'l-Kurd fi binâi 'l-hedâreti 'l-Îslamiyye*, Dâru 'l-Kutubi 'l-Îlmiyye, Lübnan 2010.
- Bruinessen, Martin van, *Ağa, Şeyh, Devlet*, Wergêr: Banu Yalkut, Weşanên İletişim, Stenbol 2006.
- Cizîrî, Mele Ehmed, *Dîwan*, Wergêr, Osman Tunç, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2008.
- el-Haydarî, İbrahim, *'Unvânu 'l-mecd fi beyâni ehvâli Bexdad ve 'l-Besre ve Necd*, Dâru 'l-Kutubi 'l-Îlmiyye, Lübnan 2010.
- el-Xelîl, Ehmed, *Tarîxu 'l-Kurd fi 'l-hedâreti 'l-Îslamiyye*, Dâru Hîro, Lübnan 2007.
- Xeznedar, Maruf, *Mêjûyê Edebê Kurdî*, Çapxaneyê Aras, Hevlêr 2010.
- Kavak, Abdulcebbar, "Abdüssamed Tûdar'ın Nûru 'l-Envâr'ına Göre İran'da Şâziliyenin İzleri", *Tasavvuf İlmî ve Akademik Araştırma Dergisi*, 34(2014/2).
- Muderris, Abdulkerim, *Ulemâna fi Xidmeti 'l-Îlmî ve 'd-Dîn*, Dâru 'l-Hurriyye Li't-Tibâ'e, Bexda 1983.
- Mustafa, Nazdar Celîl, *Devru 'l-Ulemâi 'l-Kurd fi 'd-Dewletil-Osmaniyye*, Matbaatu Hacı Haşim, Erbil 2013.
- Rûhanî, Baba Merdox, *Târîx-i Meşâhûr-i Kurd*, Çapxane-i İntişârât-ı Surûş, Tehran 1382.
- es-Selefi- ed-Duskî, Hamdi Abdülmecid, Tahsin İbrahim, *Mu 'cemu 'ş-şu 'arâi 'l-Kurd*, Dâru Sipîrêz, Duhok 2008.
- Talebanî, Şêx Reza, *Dîwanê Şêx Rezayê Talebanî*, Şerh: Şakûr Mistefa, Çapxaneyê Aras, Hevlêr 2010.
- Tenik, Ali, *Tarihsel Süreçte Kürt Coğrafyasında Tasavvuf ve Tarikatlar*, Nûbihar Yayınları, İstanbul 2015.